Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

# Ji 2/1/2025 ve guherîn li îqameyên parastina navneteweyî dibin

Îqameyên parastina navneteweyî kurt dibin û parastina navneteweyî ji 2/1/2025 ve dibe demkî piştî ku guherînên qanûna biyaniyan dest pê dikin.

Îqameyên parastina navneteweyî ev in

- penageh ku li ser bingehê mafê penaberiyê tê dayîn û
- îqameya li ser bingehê parastina duyem.

## Îqameyên parastina navneteweî çawa kurt dibin?

Îqameyên yekem û domandinê li ser bingehê penageh yan parastina navneteweyî pêştir bo 4 salan dihatin dayîn.

Îqame ji 2/1/2025 ve wiha tên dayîn:

- Penageh bo 3 salan tê dayîn.
- Îqameya domandinê li ser bingehê penagehê bo 3 salan tê dayîn.
- Îqameya yekem li ser bingehê parastina duyem bo salekê tê dayîn.
- Îqameya domandinê li ser bingehê parastina duyem bo 2 salan tê dayîn.

## Heyama îqameya te ya niha naguhere

Guherînên li jor behskirî tenê ji bo wan îqameyên parastina navneteweyî ne ku ji 2/1/2025 ve tên dayîn.

Eger te niha îqameyek hebe li ser bingehê parastina navneteweyî û dema wê mabe, ne hewce ye ku ti tiştekî bikî. Îqameya te bi awayekî normal heta dema ku li ser karta te ya îqameyê hatiye nivîsîn berdewam e.

## Mebest ji demkîtiya parastina navneteweyî çi ye?

Mebest ji demkîtiya anku miweqediya parastina navneteweyî ew e ku Daîreya Koçberan ji berê zêdetir li hewcedariya domandina parastina navneteweyî dinêre. Îqameyên ku li ser bingehê parastina navneteweyî tên dayîn ji niha pê ve jî ji tîpa A ne anku îqameyên berdewam in lê armanc ew e ku parastina navneteweyî bidin mişterî tenê bo wê demê ku hewce be. Bo nimûne van tiştan tesîr li ser hewcedariya domandina parastinê heye:

- rewşa ewlehiya welatê te eger guherîbe piştî ku parastina navneteweyî ji te re hatiye dayîn.
- te sefer kiribe welatê xwe yan welatê berê yê lêmayîna te ya berdewam
- te pasporta dewleta ku welatiyê wê yî wergirtiye.

## Tawan ji berê zêdetir tesîrê li dayîn û betalkirina parastina navneteweyî dikin

Guherîna qanûnê hinek sebebên nû yên nedayîna yan betalkirina parastina navneteweyî zêdetir dike. Li ser malpera me bixwîne ka di çi haletan de parastina navneteweyî dikare neyê dayîn.

Li ser malpera me bixwîne ka di çi haletan de Daîreya Koçberan dikare mafê penaberiyê yan parastina duyem betal bike.